Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :807 28-Cotmeh- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

Femandarekî QSD'ê: Bi êrişeke sêalî xwestin Eyn Îsa dagîr bikin, lê êriş hatin şkandin

Ji fermandarên QSD'ê yên navçeya Eyn Îsa Ezîz Xerbîsan, êrîşên li dijî navçeyê pêk hatîn nirxandin û got, "Hêza me pêşî li komkujiyeke mezin girt. Hewldan û amadekariya dagîrkeran heye ku navçeyê dagîr bikin. Li dijî van hewldanan em 24 saetan şiyar in."

21`ê Cotmehê komek çete û leşkerên dewleta tirkî ya dagîrker hewl dan navçeya Eyn Îsa dagîr bikin. Di encama bersiva şervanên Meclisa Leşkerî ya Eyn Îsa de êriş hatin şkandin. Piştî şerê 3 saetan, çete û leşkerên dewleta tirkî çekên xwe hiştin û reviyan. Li aliyê din balafirên keşfê û yên şer li ser asîmanê navçeya Eyn Îsa û gundewarê wê geriyan. Têkildarî mijarê, ji fermandarên QSD'ê yên navçeya Eyn Îsa Ezîz Xerbîsan ji ANHA re axivî.

JI 3 ALIYAN VE ÊRIŞ KIRIN Û ÊRIŞÊN WAN HATin ŞKANDIN

Ji fermandarên QSD`ê Ezîz Xerbîsan bal kişand ser armanca dagirkeran û got: "Artêşa Tirk a dagirker ji aliyê gundê Seyda yê ku dikeve bakur û rojhilatê Eyn Îsa ve û ji aliyê rêya M4`ê û aliyê kampa li rojavayê Girê Spî ve, hewl da derbasî navçeyê bibe. Zêdetirî 50 çete û leşkerên artêşa Tirk a dagirker ji 3 aliyan ve xwestin derbasî navçeyê bibin û li ser şêniyên navçeyê û gundewarê wê komkujiyekê pêk bînin. Lê belê hewldana wan hate têkbirin. Ev ne cara yekê ye ku dagirker dixwazin derbasî navçeyê bibin û dagir bikin, lê belê rastî bersivdayîna şervanên me tên."

'RÛSYA Û HIKÛMETA ŞAMÊ DÎSA BÊDENG MAN'

Ezîz Xerbîsan destnîşan kir ku di êrişan de leşkerên hikûmeta Şamê û Rûsya tu helwest nîşan nedan û wiha dewam kir: "Ev êriş li ber çavên van hêzan pêk hat. Di encama êrişan de mal û milkên sivîlan jî hatin hedefgirtin. Li rêya M4`ê ya di navbera navçeya Çelebiyê û Eyn Îsayê de ku sivîl tê re derbas dibin, êriş pêk tên. Erebeyên li ser vê rê diçin û tên, rastî siûqest û topbaranê tên."

'HEWL DIDIN BAREGEHÊN XWE ZÊDE BIKIN'

Xerbîsan anî ziman ku dagirker di xeta gundewarê Eyn Îsayê û gundewarê rojavayê Girê Spî amadekariya şerekî mezin dikin û got: "Çeper û binerdan çê dikin û sewqiyatên leşkerî hene. Bi vê yekê dixwazin barergeh û nuqteyên xwe zêde bikin. Li gundê Seyda mewziyên xwe çêdikin û hewl didin li gund baregehekê ava bikin."

'24 SAETAN HIŞYAR IN'

Fermandarê QSD`ê Ezîz Xerbîsan diyar kir ku çi dibe bila bibe, wê heta dawiyê bersiva dagirkeran bidin û axa xwe biparêzin û wiha lê zêde kir: "Em nahêlin ku navçeya Eyn Îsayê dagir bikin û zirarê bidin gelê me. Ev parastina rewa ye. Em jî 24 saetan hişyar in. Ew nikarin bihostekê jî derbasî xaka Eyn Îsayê bibin."

KCK: Perwerdeya bi kurdî destkeftiya herî hêja ya şoreşa Rojava ye

Komîteya Perwerdeyê ya KCK'ê bal kişand ser xwesteka ENKS'ê ya li dijî perwerdeya kurdî û pergala hevserokatiyê û diyar kir ku xwendina bi zimanê kurdî destkeftiya herî binirx ya şoreşa Rojava ye û pêkhatina xewna bi sedê salan e.

Komîteya Perwerdeyê ya KCK'ê bi daxuyaniyeke nivîskî bal kişand ser daxwaziya ENKS'ê ya rakirina perwerdeya bi zimanê kurdî û li şûna wê danîna pergala perwerdeyê ya hikumeta Şamê û rakirina pergala hevserokatiyê. Komîteya Perwerdeyê ya KCK'ê di daxuyaniya xwe de wiha da zanîn:

"Dagîrkeran bi sedê salan bi armanca ku bikarin hebûna gelê Kurd ji holê rakin, êrîşên cur bi cur ên dirinde li ser ziman, nasname û çanda me, kevneşop û nirxên me meşandin. Işkence, girtin, kuştin, şewitandin, bi pist panzeran ve kişandin jî di navê de; bi hovîtî kuştina me de tu sînoran nas nekirin. Li her çar beşên welat ne tenê li cihên fermî û dibistanan, nehiştin em li malên xwe jî bi zimanê xwe biaxivin. Bi hezaran keç û xort, jin û zarok, kal û pîr ji ber ku xwedî li hebûn û çanda xwe derketin, li Efrînê, li Serêkanî û Qamişloyê, li Cizîrê û Nisêbînê, li Mehabad û Sineyê, li Ranya û Silêmaniyê û li Sûrê bi hovîtî hatin qetilkirin. Ciwanên me li welatên biyanî bi destê nîjadperestên dagirker bi tawana ku 'Kurd in û bi kurdî dipeyivin' hatin kuştin. Çendîn caran Kurdên ji ber gotina stranên kurdî hatin kuştin, bûn rojevê rojname û televîzyonan.

'YEKÎTIYA NETEWEYÎ PÊDIVIYEKE BIVÊNEVÊ YE'

Lê îro dost-dijmin her kes baş dizane; êdî Kurdek li pêşberî wan heye ku doza mafê xwe dike, ji bo bi destxistina azadiya xwe amade ye berdêl û derfetên bi destxistina mafên neteweyî û demokratîk a gelê me ku hatibûn desteserkirin jî, îro ji her demekê zêdetir e û şoreşa Rojava mînaka vê ya herî şênber e. Ji ber vê yekê dijminên me ku hebûna xwe di tunebûna me de dibînin; di serî de li Rojava, li her cihekî destkeftiyên me dikin hedef û li ser qad, bajar, navçe û gundên me ku di encama berdêlên giran de hatin azadkirin, êrîşên piralî bi pêş dixin. Di rewşeke wisa de tê xwestin; xeta wê ya siyasî çi dibe bila bibe hemû derdorên Kurd ên welatparêz û demokrat bikarin di bingeha mafên neteweyî û demokratîk de xwedî helwestên neteweyî bin. Ji ber ku di mercên îro de yekrêziya neteweyî êdî ji bijareyek zêdetir, ji bo me pêdiviyeke jêneger e.

Lê belê, di van rojên dawîn de daxuyaniya ENKS'ê ya li dibistanên heremên girêdayê Rêveberiya Xweser vegera minhaca hikumeta Şamê û rakirina sîstema hevserokatiyê, bi eşkereyî tê wateya ji dijmin zêdetir dijminatiya li hember nirx û destkeftiyên gelê Kurd û gelên din ê heremê. Heman ENKS'ê ku piştî hevdîtina li gel rayedarên dewleta Tirk a faşîst bi gotina "Dîploma anku şehadeya dibistanên herêma Rêveberiya Xweser li qada navdewletî ne derbasdar in" xwe wekî ku pêşeroja Kurdan difikire nîşan bide jî, a rast ev e ku bê ziman ne tenê Kurd, tu neteweyek nikare xwedî nasname, hebûn û pêşerojeke azad be. Ev çêkera dij-Kurd û dij-demokrat ku her kêlî şoreşa Rojava bi gotina hevkariya li gel hikumeta Şamê tawanbar dikir, îro bi helwesta xwe ya li hember perwerdeya bi zimanê kurdî û bi piştgiriya xwe ya ji bo vegera minhaca rejîma Sûriyê du rastî bi hev re eşkere kirin: A yekem; ENKS'ê ji ber ku bi tu şêweyî beşdarî pêvajoya tekoşîna şoreşê nebû û tu berdêl nedan, lewma xwedî derketina destkeftiyên şoreşê jî wek erkê xwe nabîne û amade ye ku li ser destkeftên heyî bazarê bike. A duyem; ew jî gelek baş dizane ku di serî de gelê Kurd, gelên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê bi tu şêweyî ne dazwaza vegera minhaca rejîmê, ne jî rakirina sîstema hevserokatiyê qebûl nekin. Ew ê jî bi van rojevên pûç bikare pêvajoya hevdîtinên yekitiya neteweyî bi qasî ji dest tê, dirêj bike, bixe warekî aloz û di encamê de PYNK'ê bi têkdana hevdîtinan tawanbar bike. Bi van tevan eşkere ye ku ENKS bi vê helwesta xwe ne tenê li dijî şoreşa Rojava ye, bi ew qasî jî li dijî ziman û çanda kurdî ye û bi vê pêşniyarê bi rengekî vekirî ji netewperestiya Tirk, Ereb û Fars dixwaze ku polîtîkayên xwe yên qirkirin û bişaftinê bidomînin.

'DIJBERIYA HEVSEROKATIYÊ DIJBERIYA WEKHEVIYA ZAYENDAN E'

ENKS'ê di daxuyaniya xwe de diyar kiriye ku hebûna sîstema hevserokatiyê hin derdoran bi hêrs dike. Ev daxuyanî bi rengekî rasterast berdevkiya dijminan e û bi zimanê dijminên gelê Kurd axaftin e. Kurd şoreşê ne ji bo vê kirin ku bila dijmin hêrs nebe. Sîstema Hevserokatî di hemû qadên xebatê a Rêveberiya Xweser de pîvana sereke a nûnertiya wekhev a zayendan e û bi vê tê xwestin jin jî wek zilaman bikarin bi rengekî wekhev beşdarî hemû qadên jiyanê û erkê rêveberiyê bibin. Dijberiya ENKS'ê ya vê pîvana demokrasiyê, di cewher de dijberiya wê ya li hember wekheviya zayendan û xeta jinên azad e. Hemû derdor dizanin ku ruxmê dijberiya ENKS'ê ya li hember şoreşa Rojava û kiryarên wê yên dûrî zanebûna neteweyî û exlaqî; gelê me hevdîtina di navbera PYNK û ENKS'ê bi îhtîmala ku dikare tevkariyê avakirina yekitiya neteweyî bike, destkeftiyên şoreşa Rojava xurttir bike û ENKS'ê jî bikare vegere nav rêza yekitiyê, erê kir. Lê xuya ye ku heta niha di sekna wê ya hevkariya li gel dijminan tu guherîn çênebûye.

'DIVÊ ENKS DEV JI ZIMANÊ LI DIJÎ DESTKEFTIYÊN KURDAN BERDE'

Lewma, em wek Komîteya Perwerdeyê ya KCK'ê bi dubareyî destnîşan dikin ku ji dibistanên dayikê heya zanîngehan xwendina bi zimanê kurdî destkeftiya herî bi nirx a şoreşa Rojava ye û pêkhatina xewna bi sedan salan e. Ji ber vê ye ku îro li hemû qadên Bakur-Rojhilatê Sûriyê heta Helebê gel li hember ENKS'ê di nav çalakiyan de ye. Li ser vê bingehê em careke din bang li hemû Kurdên welatparêz, derdorên azadîxwaz û rayagiştî a demokratîk dikin ku li hember van daxwazên dijminane helwestên xwe xurttir bikin. Di heman demê de em bang li ENKS'ê jî dikin da ku ji demek beriya demekê zûtir dest ji vê zimanê dij destkeftên Kurd berde, ji deh hezaran şehîdên ji bo azadiya ziman canê xwe feda kiriye, ji malbatên şehîdan, ji têkoşîna xeta jina azad û ji hemû gelê Kurd lêborînê bixwaze."

Hewldana ketina gundê Xalidiyê hat bêbandorkirin

Hêzên dagîrker hewl dan careke din bikevin gundê Xalidiyê û riya M4 ya rojavayê navçeya Eyn Îsa. Êriş ji aliyê şervanan ve hat şkandin. *R-2*

Kongreya Star ji bo piştgiriya hêzên parastinê meşiya

Bi armanca piştgiriya hêzên parastinê endamên Kongreya Star li Herêma Firatê bi durişma "Na ji qirkirin û dagîrkeriyê re emê jin û jiyanê biparêzin" meşeke girseyî li dar xistin. *R-2*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 807 28-Cotmeh- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

Koordînasyona KJK'ê şehîd Bêrîtan bîr anî

Koordînasyona KJK'ê, Gulnaz Karataş (Bêrîtan) di salvegera 28'an ya şehadeta wê de bîr anî û berxwedana hêzên YJA Starê yên li Heftenînê li dijî êrişên dagirkeriyê, silav kir. *R-3*

Dijberiya ziman!.. Çima?

Xewn û xeyalê Kurdan bû ku rojekê zarokên wan bi zimanê xwe perwerdeyê bibinin. Bi têkoşîn û berxwedaneke pir mezin û bi xwîna bi hezaran ciwanên Kurd îro ev xewn li rojavayê Kurdistanê pêk hatiye. Li şûna ku her kes ji vê rewşê bextewer û serbilind be, ENKS ji PYNKê re dibêje yek ji şertên me yên lihevkirinê rakirina perwerdeya bi zimanê kurdî ye! Gelo ev daxwazî ji bo çi ye? Ma ji bilî vî zimanî çi yê Kurdan maye? KCKê bi daxuyaniyekê bal kişandiye ser vê mijarê

Peymana li ser Şingalê bi daxwaziya Tirkiya dagîrker çêbû

Siyasetmedarê Kurd Mihemed Emîn Pênciwînî diyar kir ku peymana li ser Şingalê ya di navbera hikumeta Iraqê û PDK'ê de, bi daxwaziya Tirkiyê pêk hat û got, eger Êzîdî vê carê jî bêdestek werin hiştin wê karesateke din were serê wan. *R-4*

PDK vê carê hêza xwe dişîne Garê

PDK'ê hêzeke xwe ya taybet şand herêma Garê û destê bi çêkirina çeper û baregehên nû kir. *R-5*

Li kampa Waşokanî dibistaneke nû hat vekirin

Komeleya "Help Kurdistan" avayiyeke ji bo dibistanê ava kirî radestî Rêveberiya Dibistanan ya kampa Waşokanî kir. *R-6*

Lêpirsîna Hovîtiya ... Derwêş M. Ferho *R-6*
Girîngiya ZIMAN ... Ahmet Aktaş *R-4*
Sûriya berê mûmkin e? Zekî Bedran *R-5*

Kevana Zêrîn banga yekîtî û parastina ziman li partiyên siyasî kir

Endamên Tevgera Kevana Zêrîn bang li partiyên siyasî kir ku destkeftiyên şoreşa Rojava bi taybetî çand û zimanê kurdî biparêzin û yekîtiya neteweyî pêk bînin. *R-7*

Hewldana ketina gundê Xalidiye hat bêbandorkirin

Hêzên dagîrker hewl dan careke din bikevin gundê Xalidiyê û riya M4 ya rojavayê navçeya Eyn Îsa. Êriş ji aliyê şervanan ve hat şkandin.

Leşkerên artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê careke din hewl dan derbasî riya M4 û gundê Xalidiyê yê rojavayê Eyn Îsa bibin. Şervanan di çarçoveya mafê parastina rewa de bersiv da. Li gorî agahiyan kuştî û birîndarên çeteyan hene.
Piştî şkestinê hêzên dagîrker gundê Xalidiyê, Hoşan û riya M4 topbaran kirin.
Piştî nîvro jî hêzên dagîrker hewl dan derbasî van deveran bibin, hewldana wan hat bêbandorkirin.

YRA ji bo dema pêş bihêvî ye.

Hediya HISÊN-Qamişlo

Bi durişma "Ragihandina Pîşedar Misgoriya Guhertina Ber Bi Civakê Ve Ye" Yekîtiya Ragihandina Azad 23yê Cotmeha 2020an li Hola Zana, ya bajarê Qamişlo kongreya xwe ya 5. li dar xist.
Kongreyê bi beşdariya endamên YRA û tevlîbûna zêdetirî 200 rojnemevanî dest pê kir.
Derbarê mijarê de Hevserokê Yekîtîya Ragihandina Azad Bangîn Sîdo ji rojnameya me re wiha axivî: "Di vê kongreya me ya 5. de ku hat lidarxistin, me xwest karê YRA bi berfirehî binirxînin û nerînên endam û rojnemvanan bigirin. Me rapora kar û xebata 2 salan xwend û nirxand. Ji bo karê nehatî kirin gelek rexne li meclisê û hevserokan hatin kirin. Lê di nirxandinan de çawa ku aliyên erînî hebûn, aliyên kêm jî, (weke mijara rêxintinî, berfirehkirina kar û çalakiyên ji bo rojnamevanan) hatin rexnekirin. Me ev rexne tomar kirin û hêvî dikin di paşrojê de ew kêmayî neyên dubarekirin.
Bangîn Sîdo axaftina xwe wiha domand: "Sala borî ji bo çend sedeman me hin zehmetî kişandin. Ji ber şer û dagîrkeriya li Serê Kaniyê û Girê Spî saleke giran bû. Gelek hevalên me yên rojnamevan şehîd û birîndar bûn. Digel van hin endamên me kêm xebitîn. Ji ber wê di aliyê rêxstinî de em gelek lewaz man. Me nikarî komî ser hev bibin û plana dema pêş pêk bînin. Ji bo

rakirina van kêmayiyan me di vê kongreya xwe de mecliseke nû hilbijart. Em bi hêvî ne ku rêveberiya me ya nû van mijaran çareser bike."
Bangîn Sîdo axaftina xwe wiha qedand: "Emê hewl bidin li rojnemevanan xwedî derkevin û mafê wan biparêzin. Herwiha emê li nerîn û pirsgirêkên wan gudarî bikin û çareseriyê ji wan re bibînin. Em hêvî dikin ku di rojên pêş de pirtir li hev kom bibin û karê ragihandinê pêş bixin. Serkeftinê ji ragihandina azad re dixwazim."

Yekîtiya Rewşenbîrên Cizîrê konfransa xwe ya 4. li dar xist

Bi durişma "Bi berxwedana ramyarî, emê şoreşa çandê bi ser bixin" roja Înê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê konferansa xwe ya 4. bi amadebûna 100 delegeyan li dar xist.
Konferans li hola Zanîngeha Rojava ya bajarê Qamişlo li dar ket. Endamên Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûrî, Yekitiya Nivîskarên Kurdistan-Sûriyê, Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê û Komîteya Wêjeyî ya Rojavayê Kurdistanê tê de amade bûn.
Hevseroka TEV-DEM`ê Zelal Cîger di konferansê de axivî, bal kişand ser rola ku dikeve ser milê rewşenbîran di têkoşîna azadiyê de û got: "Reşenbîr dikarin dîrokê mayînde bikin."
Zelal bal kişand ser rewşa siyasî û wiha dewam kir: "Her rewşenbîrek siyasetmedarek e. Rewşenbîr wekî zanyaran in, ji ber ku siyaset zanebûn e, zanista civakê ye û derxistina rastiya dîrokê ye."
Herwiha diyar kir ku armanca kiryarên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Kurdan li her çar parçeyên Kurdistanê ew e ku gel negihêje azadiya xwe. Ji ber ku gelê Kurd xwedî nirxên wekheviyê û jiyana hevbeş e. Piştre serokê Yekitiya Nivîskarên Kurdistan-Sûriyê Ebd El-Samad Mehmûd wiha axivî: "Erka ku dikeve ser milê rewşenbîran ew e ku dîroka îmhakirina gelê me tune bikin, dîroka serdema nû binivîsin."

Kongreya YRA qediya

Kongreya Yekîtiya Ragihandina Azad ya 5. bi hilbijartina hevserokan û 17 endamên meclisa gişti bi dawî bû.

Kongreya Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) ya 5. roja Înê li Hola Zana ya li bajarê Qamişlo dest pê kir.
Piştî axaftinan, ji bo rêvebirina kongreyê 3 endamên dîwanê hatin hilbijartin.
Piştre rapora du salan ya xebata yekîtiyê hat nirxandin û ji bo pêşxistina rewşa ragihandinê pêşniyar hatin gitin.
Herwiha rêziknameya yekitiyê hate xwendin û xalên hatin nîqaşkirin, li gorî nîqaş û pênşiyarên beşdaran guhertin di rêzikanameyê de hatin pêkanîn û bi erêkirina piraniya delegeyan hate erêkirin.
Di dawiyê de hilbijartin çêbû. Evîn Yûsiv û Bengîn Seydo ji bo dewreya 2. ya hevserokatiyê, 17 kes jî ji bo endamtiya meclisa gişti ya nû ya yekştiyê hatin hilbijartin.

Kongreya Star ji bo piştgiriya hêzên parastinê meşiya

Bi armanca piştgiriya hêzên parastinê endamên Kongreya Star li Herêma Firatê bi durişma "Na ji qirkirin û dagîrkeriyê re emê jin û jiyanê biparêzin" meşeke girseyî li dar xistin.
Li Kobanê di çarçoveya hemleya Kongreya Star ya li dijî êriş û dagîrkeriya li bakur û rojhilatê Sûriyê de, herwiha êrişa ser jinan ku 8'ê Cotmehê dest pê kirbû, ji bo piştgiriya hêzên parastinê û bi durişma "Na ji qirkirin û dagîrkeriyê re emê jin û jiyanê biparêzin" meşeke girseyî hat lidarxistin. Meş bi beşdariya bi sedan ji şênîyên Herêma Firatê, saziyên civaka sîvîl, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, Meclisa Malbatên Şehîdan û Partiyên Siyasî hat lidarxistin. Meş ji Qada Jina Azad dest pê kir û li qada Şehîd Egîd rawestiya.
Piştî rêzgirtinê berdevka Kongreya Star ya Herêma Firatê Mizgîn Xelîl axivî.
Mizgînê berxwedana parezvanên rûmetê silav kir û wiha got: "Hêzên parastina rûmetê di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de li dijî tevahî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê û dewleta tirk şer kirin û gelê xwe parastin. Şervanên me ji Kobanê ber bi Minbic, Reqa û herî dawî Dêrezorê soza serkeftinê dan û bi cih anîn. Loma ew bûn sembol û pêşengên jinên vê şoreşê. Em jî weke Kongreya Star berxwedan û têkoşîna wan silav dikin û dibêjin çawa ku hûn li dijî DAIŞ'ê bi serketin, em ê li dijî hişmendiya serdest û dagirkeriyê têkoşîn bikin û bi ser kevin."
Çalakî bi durişma"Jiyan jiyan azadî" bi dawî bû.

Ciwanên Partiya Sûriya Paşrojê konferansa xwe ya yekê li dar xistin

Dilîn EHMED Ronahî-Qamişlo

Ciwanên Partiya Sûriya Paşrojê, bi durişma "Ji Bo Sûriyeke Azad, Bi Têkoşîna Yekbûyî Ya Gelan Emê Teqez Bi Ser Bikevin" konferansa xwe ya yekê li dar xistin.
Konferansê bi rêzgirtina ji bo şehîda dest pê kir. Piştre nûnerên Partiya Sûriya Paşrojê, Saziya Malbatên Şehîdan, Rêveberiya Xweser, Meclisa Ciwanên demokrat û Ciwanên Şoreşger axaftin kirin. Herwiha peyamên sazî û partiyên di konferansê de amade nebûyîn hatin xwendin.
Xalên di konferansê de hatîn nîqaşkirin wiha bûn.
Avakirina du meclisên ciwanan, hilbijartina rêveberiyeke nû, çalakiyên ciwanan yên du salên borî, pêşniyar û perspektîfên ji bo Partiya Sûriya Paşerojê.
Rêvebera Ofîsa Ciwanên Partiya Sûriya Paşrojê ya herêma Cizîrê Darîn Beşar, li ser armanca konferansê ji rojnameya me re wiha axivî: "Ev konfransa yekê ya herêma Cizîrê ye. Me konferansên xwe yên bi vî rengî li bajarê Reqa, Tebqa, Minbic, Heleb û herêma Şehba li dar xistin. 27ê Adara 2018an ji bo ciwanan di partiyê de ofîsek hat vekirin. Lê ji ber pirbûna tevlîbûna ciwanan, ji bo berfirehkirina karê wan, emê du meclisan ava bikin. Yek ji bo herêma Cizîrê li Qamilo, ya din li bajarê Hesekê. Me bi vê armancê konferans li dar xist."
Darîn Beşar di dawiyê de serkeftin ji kar û xebata ciwanan re xwest û hêvî kir ku têkoşîna xwe pêştir bixin.

Kevana Zêrîn banga yekîtî û parastina ziman li partiyên siyasî kir

Endamên Tevgera Kevana Zêrîn bang li partiyên siyasî kir ku destkeftiyên şoreşa Rojava bi taybetî çand û zimanê kurdî biparêzin û yekîtiya neteweyî pêk bînin.

Endamên Tevgera Kevana Zêrîn yên bajarokê Rimêlan bi daxuyaniyekê nerazîbûn nîşanî şertên hin partiyên kurdî yên betalkirina perwerdeya bi zimanê kurdî li dibistanên bakur û rojhilatê Sûriyê dan.
Endama Tevgera Kevana Zêrîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê Ronahî Şêxo daxuyanî xwend û got: "Partiyên siyasî yên li Rojavayê Kurdistatnê hewl didin yekitiya neteweyî pêk were. Li ser vê yekê pêvajoya yekemîn dest pê kir da ku hêviyên gelê Kurd bi cih bînin. Em hemû dizanin ku di çarçoveya planên navneteweyî de yên ku Kurdistan parçe kirin, ji parçekirina ax û gelê me têr nebûn, lê belê bi salan hewl dan şerê zimanê Kurd bikin û çand û civaka me îmha bikin. Lê gelê Kurd têkoşiya û li ber xwe da da ku nasname û hebûna xwe biparêze.
Em di Tevgera Kevana Zêrîn de, erka me ye ku nirxên gelên xwe li parçeyên Kurdistanê biparêzin, erkên me yên pêşîn ziman û çanda xwe bipaêrzin, ji ber ku bingha herî bi hêz a civaka Kurde. Pêkanîna yekitiya neteweyî jî girîng e, ji ber ku wesîleya parastina ax, ziman û çanda me ye. Hin partiyên siyasî yên Kurdî di demekê de ku ferzkirina zimanê tirkî li şênî û xwendekarên me yên li Efrîna dagirkirî şermezar nakin, em îro wan dibînin ku perwerdeya bi zimanê dayikê

(Kurdî), li herêmên me yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê red dikin. Em jinên Kurd vê helwestê wan şeremzar dikin. Ji ber ku ziman, hebûn û nasnameya me ye. Yên destên xwe dirêjî nirx û şoreşa me dikin ew bi yekitiya neteweyî re xiyanetê dikin û daxwazên pergalên dagirkeran bi cih tînin. Lew ra divê hemû partiyên siyasî li hemberî planên dewletên dagirker rabin û ji bo parastina zimanê kurdî û destkeftiyên şoreşa Rojava kar bikin. Dîs divê yekitiya netewî pêk bînin ji ber ku hêviya tekane ya gelê me ye ku binpêkirinên navnetewî yên li dijî gelê me bi dawî bibin."

'Li dijî qedexeyan li şanogeriya bi kurdî xwedî derkevin'

Dîlan Korhan/ANF

Endama Koma Şanoya Hêvî Yekta Ronahî Herekol, diyar kir ku bi qedexeyan dixwazin zimanê kurdî ji holê rakin û got, "Li dijî qedexeyên lîstlkên bi kurdî divê şanoger û ciwan li şanogeriya bi kurdî xwedî derkevin."
Şanoya Bajêr ya Şaredariya Bajarê Mezin ya Stenbolê (İBB), 21ê Îlonê, ji bo şanoyên taybet ku di pêvajoya vîrûsa koronayê de rojên zehmet derbas kiribûn, biryar dabû ku di serdema xwe ya nû de cih bide 50 lîstikan. Yek ji wan wan Lîstika Bêrû ya Koma Şanoyê ya Teatra Jîyana Nû ya Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (MKM) bû ku ji aliyê nivîskarê lîstikan Daîro Fo ve hatiye nivîsandin. Lê dema ku çend saet ji lîstikê

re mabûn, ji aliyê Qaymeqamiya Gazîosmanpaşayê ve bi hinceta"ewleyiyê"hat qedexekirin.
Roja ewil lîstikvanên Lîstika Bêrû bertek nîşanî qedexekirina lîstika xwe dan û gotin ku hinceta qedexeyê bêtehemûliya li hemberî çand, huner û zimanê kurdî ye. Bertek û nerazîbûnên li hemberî qedexeyê her roja ku derbas bû zêdetir bû. Lîstikvana şanoyê ya Koma Hêvî Yekta Ronahî Herekol, li Wargeha Penaberan a Mexmûrê bi şanogeriyê dike, bertek nîşanî qedexeyê da û banga xwedî li derketina şanogeriya bi kurdî kir.
Ronahî, di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser qedexeyên ser ziman û got: "Ez qedexeya li ser şanoya kurdî hatî kirin şermezardikim. Bi rastî tiştek wisa ne ji rêzêye û nayê qebûlkirin."
'Qedexeya şanogeriya bi kurdî nayê qebûlkirin'
Ronahî diyar kir ku şano ji bo kurdan qadek girîng e û wiha nêrînê xwe anî ziman: "Di nava civaka kurdan de şano cihekî xwe yê gelek girîng heye ji ber di dîroka me kurdan gelek êş û zorî hene. Dewleta tirk li bakurê Kurdistanê zimanê kurdî qedexe kiriye. Êdî nahelin ku bi zimanê kurdî şanogerî bê kirin. Kurd bi rêya şanoyê dixwazin xwe îfade bikin lê rê li ber vê jî hat girtin. Ji ber ku her lîstîkek di nava mejiyê civakê de gelek tiştan dide avakirin, li dijî vê yekê qedexe tê kirin. Qedexekirina şanoya bi kurdî nayê qebûlkirin û ji ber ku şanogeriya bi kurdî mafekî xwezayî ye."
'Li ziman û şanogeriyê xwedî derkevin'
Ronahî, di axaftina xwe de banga xwedî li derketina şanoya bi kurdî kir û wiha bi lêv kir: "Divê em li dijî qedexeya li ser şanoya kurdî bêtir xwedî li zimanê xwe derkevin. Em li dijî polîtîkayên bişaftinê ya li ser ziman vala derxin. Lê divê bê zanîn ku şanogerên kurd li gel qedexe û zehmetiyan dê şanogertiya xwe bidomînin. Her wiha divê hemû şanogerên kurd û ciwanên kurd xwedî kurdî û şanogeriya bi kurdî derkevin."

Mihrîcana Folklorê ya Jinan hat lidarxistin

Bi durişma "Bi rengên folklora me, çanda civakên me dewlemend dibe" roja Yekşemê Mihrîcana yeke ya Folklorê ya Jinan li ser asta herêma Minbic, Reqa, Tebqa û Dêrezorê ji bo vejandina folklora erebî ya resen û folklora jinên herêma Firatê, hat lidarxistin.

Mihrîcan li Yarîgeha Beledî (Reş) ya navenda Reqayê hat lidarxistin û jin û şêniyên bajarê Reqayê û mêvanên ji herêma Tebqa û bajarê Dêrazor û Minbicê beşdar bûn.
Herwiha nûnerên Partiya Sûriya Paşrojê, hêzên leşkerî û ewlekariyê, hevseroka Meclisa Sivîl a Reqayê Leyla Mistefa, şandeyên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Hêzên Parastina Civakî (HPC), di mîhrîcanê de amade bûn.
Mihrîcanê bi axaftina Rêveberiya Jinan a Reqayê Xaliye El-Kecwan dest pê kir.
Xaliye lidarixistina mîhrîcana yekemîn a li ser asta herêmê, pîroz kir.
Piştre endama Rêveberiya Jinan a Reqayê Meryem El-Ebo û bi navê Saziya Malbatên Şehîdan a bajarê Minbicê Nisrîn El-Elî axivîn.
Axaftvanan diyar kir ku mihrîcan bi saya ked û têkoşîna jinên azad ên li herêmên erebî ku hêza xwe ji berxwedana li dijî dagirkeran girtin, hat lidarxistin.
Di mihrîcanê de, hunermend û tîmên çandê yên ji herêmên cuda beşdar bûne, pêşandanên hunerî yên taybet bi folklora herêmê, pêşkêş kirin.
Herwiha şervanên Yekîneyên

Parastina Jinan (YPJ) şanoyek li ser lehengî û destkeftiyên jinan ên di berxwedana li herêmê de, pêşkêş kirin.
Koma Duret Firat ya ji Dêrezorê jî stiran û dîlanên ji folklorî yên erebî û kurdî pêşkêş kirin.
Di dawiyê de hunermend Yasmîn Esker berhemeke hunerî pêşkêş kir û beşdaran li ber dîlan gerand.

Xiyanet

Sîpan Şînda

Dema ez navê xiyanetê dibihîzim kutîn ji dilê min tê. Hinga navê xiyanetê li ber guhê min re dibore cinîq bi min ve tên. Çawa navê xiyanetê di sohbetan de derbas dibe, gotin ji bîra min diçin.
Dema navê xiyanetê dibe dabaş ez bêhiş dibim, heştên min têkilêk dibin û sewdayê min ji serê min diçe. Belê xiyanet, hesta wêran, kurmê malxirabînê. Ew hesta ku mirovî ji mirovatiyê derdixe, eqil û mejî ji serê mirovî dibe, mirovî di jiyanê de rezîl û perîşan dike, keseyatiya mirovî ji binî têk dibe. Belê, hesta xiyanetê hesteke welê ye ku dema mirov xwe radeştî wê kir, êdî mirov ji exlaq û etîkê qut dibe. Ew weke kurmekê dikeve di nava xwîna mirovî de û êdî mirov nikare wê bi hêsanîkê ji nava xwîna xwe paqij ji bike. Xiyanet, kesayetiyê dihilweşîne, mejî û heştan gemarî dike, têkiliyên bi mirovan re jehrî dide. Ew ne tenê têkiliyên mirovî yên bi derûdora mirovî re jehrî dide, herweha mirovî bi xwe ji têk dibe. Ew kesên ku dikevin di nava davên xiyanetê, her tim weke mirovê birîndar û nexweşin. Weke nexweşê ku roj bi roj dihele, lê nizane nexweşiya wî/ê çî ye û çi derman ji jêre feyde nake. Xayîn dikare xwe bikuje û ji halê rake, lê xiyanet bi xayînî re namire. Ew weke bîhna genî li her derê belav dibe û kes, êl û civakê aciz dike. Xayîn dimire, lê belê xiyanet dîsa ji li pey wî dimîne û nahêle ew di gorê de ji bi rihetî razê. Êşa ku xiyanet dide xayînî gelek mezin e, êşkenca wê ji ya zebaniyan xirabtir û dijwartir e. Dibe ku êşkenca zebaniyan demdar be, lê ya xiyanetê bêdawî ye. Dibe ku zebanî bêjin me tu efû kirî, lê xiyanet tu carî li xayîn nabûre. Heta xayîn sax e, xiyanet qirika wî/ê digire û nahêle ew nefesê bisîtîne. Xiyanet, xayîn sernifs dike, çav şir dike, bêbawerî dike. Heçîke xiyanet e, ew neyarê xayînî yê herî xedar e. Çawa kesên xwedî neyar bin nikarin rihet razên, serbest bigerin, dera bivên biçinê; xiyanet ji xirabtir tîne serê xayîn. Xiyanet, di kesayetiyên têkçûyî re derdikeve. Lê dema xiyanet li erdekê şîn bî, êdî bi rihetî jê wêderê xelas ji nabe. Heta ku xayînî dikuje. Belê, xiyanet hemû jiyana xayîn têk dibe, serûbin dike; xayîn hayî ji vê heye, hem ji baş, lê derketina li destê xiyanetê ne ewqasî hêsaniye. Jiber ku xiyanet bê wijdan e, bê însaf e û dilê wê li tu kesê naşewite. Dema kesek ket di nava lepên xiyanetê de, êdî ew ji jiyanê qut dibe. Xiyanet di serî de mejî, dil û giyanê xayîn dîl digire û wan ji xayîn vediqetîne. Erê, xiyanet kujer e, qatil e. Lê di heman demê de ew êşkencekar e ji. Belê, xiyanet xayîn dikuje, lê naveşêre. Xayîn li erdê dimîne, kurmî dibe, siftego dibe. Ew cizayê herî mezin e ji bo xayîn, lê haya xayîn jê nîne. Xiyanet, ax xiyanet; tovê te zû kor bibe.

Li kampa Waşokanî dibistaneke nû hat vekirin

Komeleya “Help Kurdistan” avayiyeke ji bo dibistanê ava kirî radestî Rêvebiriya Dibistanan ya kampa Waşokanî kir.

Xwendekarên kampa Waşokanî bi asta Seretayî, navî û amadeyî ku jimara wan 2 hezar û 400 e, di 17 konan de perwerdeya xwe didîtin.
Bi armanca peydakirina atomosfêreke guncaw ji bo perwerdeyê, rêxistina “Sav The Children” dibistanek vekiribû. Li aliyekî din, Komeleya “Help Kurdistan” dibistanek li kampê ava kir û piştî bidawîkirina avakirinê, radestî Rêvebiriya Dibistanan ya kampê kir.
Dibistan ji 6 odeyên perwerdeyê û odeyeke rêveberiyê pêk tê. Xwendekar wê li gorî 3 dewanan perwerdeyê bibînin.
Di merasima radestkirina dibistanê de, nûnerên saziyên civaka sîvîl û bi dehan koçberên kampê amade bûn. Rêvebera komeleya “Help Kurdistan” Semîra Hesen ya şerîta vekirina dibistanê qut kir wiha got: “Armanca komeleyê ya avakirina dibistanê ew e ku atmosfereke guncaw ji bo xwendekarên ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê koçber bûyîn û ji perwerdeya xwe bêpar mayîn, re peyda bike û xwendina xwe temam bikin.”
Endamê rêveber ê Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya kampê Mihemed Haco behsa zehmetiyên ku sala borî di qada perwerdeyê de dîtine kir. Her wiha îşaret pê kir ku Rêveberiya Xweser, Heyva Sor a Kurd û Komeleya Help Kurdistan ji bo domandina sîstema perwerdeyê alîkariyan pêşkêş dikin.
Piştî vekirinê, xwendekaran dest bi perwerdeyê kir.

Deng û govenda mêşên hingiv ji min re coşeke mezin e

Jiyan BOZO / Ronahî-Qamişlo

Mêşên hingiv yan jî bi navê din heng, nezî 20 hezaran cureyên wan hene. Çend ji wan koman mezin in. Di nava wan de 60 hezar mêşên ku hingiv çêdikin hene. Di her komê de şahmakek heye. Di komê de bi sedan mêşên nêr û bi hezaran karkerên mê hene. Şan ji şimayê tên çêkirin û dixin kewaran. Hengiv xwarina kurmikên mêşan e.

EŞQA JI ZAROKATIYÊ VE

Li ser bandora mêşên hingiv li xwezayê, li mirovan û sûdgirtina ji hingiv, mêşevan Eburezaq Bozo ji rojnameya me re wiha axivî: “Ez ji xwedîkirina mêşên hingiv pir hes dikim. Ji bo min deng û govenda mêşan û girêdana wan bi hev ve coşeke mezin e. Ji pêncsaliya xwe ve ji wan hes dikim û meraq dikim. Ev 40 sal in ez mêşên hingiv xwedî dikim. Min mêşên xwe sala 1980î ji gundê Çenaxçîkê yê bajarê Amûdê anîn bajêr.

Lê ji ber rewşa herêmê ya van salên dawiyê gelek ji wan mirin. Ji xwedîkirina wan re hosteyî dive. Salê sê carî kewar vedibin. Cara yekê destpêka meha Adarê kewar tên paqijkirin. Cara duduyan meha Gulanê ye. Wê demê mêş dest bi kirina hêkan dikin. Ji bo xurtbûna şilxa nû û parastina şahmakê em du nanên hingiv derdixin, didin wan. Li herêma me kulîlik zêde nînin. Ji ber wê salê carekê demsala payîzê hingiv tê derxistin. Tişta herî zêde zerarê dide mêşên hingiv moz in. Ji bo parastina wan divê mirov her dem di nava wan de be û nêhêle moz wan bikujin. Herwisa dive bêav nemînin, şekir nedin wan û çêreya wan xwezayî be.”

LI XÊR Û BÊRA WELATÊ XWE XWEDÎ DERKEVIN

Eburezaq Bozo axaftina xwe wiha qedand: “Ji bo tendûristiya mirovan hingiv gelekî baş e. 72 derman jê çêdibin. Hem jî ji bo xweşikbûn û parasina rû jî pir baş e. Hingivê baş ji xwarin, rang û bêhna xwe tê nasîn. Hingivê bi salan di nava latan de dimîne, xweştir e û faydeya wî pirtir e. Li herêmame sê cureyên hingiv hene. 1. Yê Xernûbê. Ev nifş rengî wî kesk e. 2. Hingivê strîzerkê. Rengî wî zer e (ev her du cure hinekî tal in). 3. Yê Xeşûlê. Ev jî rengê wî sor e. Li herêma piranî ev nifş e. Hingivê şekir tê de hebe zerarke mezin dide mêşê û mirovan. Mixabin îsal ji ber şewata zeviyan min zerareke mezin dît û gelek kewarên min qeliyan. Ji ber ku mêş bi erdê re difirin zêde bilind nabin, di şewatê de piraniya wan mirin. Ji bo ku em xêr û bêra welatê xwe biparêzin divê em lê xwedî derkevin. Niha li Amûdê ez tenê mêşên hingiv xwedî dikim. Xewn û xeyalê min ew e ku li seranserê Kurdistanê û cîhanê hingivê Amûda Bavê Mihemd belav bikim.”

Malbatên sûrî yên li kampa Holê derbarê derketinê de di nava dudiliyê de ne

Hin malbatên li kampa Holê dixwazin ji kampê derkevin, lê beşeke mezin ji ber gelek sedeman naxwaze derkeve. Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê 10’ê Cotmehê biryara derxistina malbatên sûrî yên dixwazin ji kampa Holê derkevin, da.
Li kampa Holê ku 45 km. li rojhilatê bajarê Hesekê ye ji 6 hezar û 706 malbatî (24 hezar û 223 kes) pêk tê. Hin malbat dixwazin ji kampê derkevin, hin naxwazin.
Berpirsê kar û barê koçber û malbatên sûrî yên li kampê Şeiban Ebdulhemîd da zanîn ku biryar ji hina re şahî bû û ji hinan re xemgînî bû.
Berî derxistina vê biryarê malbatên sûrî bi kefaleta şêx û rûspiyan ji kampê derdiketin. Ji sala borî heta niha rêveberiya kampê ji şêniyên Dêrezor, Reqa, Tebqa 4 hezar û 789 kes ji kampê derxistine. Tê payîn ku hefteya bê beşa yekê ji malbatên sûrî yên ku dixwazin ji kampê derkevin, bê derxistin.
Li gorî serjimariya rêveberiya kampa Holê, li kampê 17 hezar û 693 malbat ango 64 hezar û 373 kes sûrî, Iraqî û biyanî hene.

Lêpirsîna Hovîtiya Dewleta tirkî li Rojava, Başûr û Nagorno-Karabax

Derwêş M. FERHO

Di parlementoya Flaman de li Bruksel lêpirsînên balkêş li ser hovîtiya dewleta tirkî li hember Rojava û Nagorno-Karabax de dibin. Bi taybetî dagirkeriya Efrînê û derdorê wê, hovîtiya li wira dike û di vê dawiyê de bi Azerbeycan re hêrîşên li ser herêma Nagorno-Karabax sedema fikarên gelek siyasetmedar û analîstên siyasî ne.
Di meha sibatê de çend parlementeran daxwaz ji serokwezîrê Flaman kiribûn ku hêrîşên dewleta Turk hember Rojava di hemû qadên karîna xwe de berbiçav bike, bide munaqeşekirin û tedbîr werin stendin. Bi berpirsiyarên YE re li ser biryarek ciddî were raweştan.
Bi taybetî firotina hemû pêdiviyên leşkerî, polîs û hêzên ewlekariyê ji Turkiyê re werin qedexekirin. Ji ber ku ev hêz van çek û male din ji bo armancên xwe yên dijî normên demokrasiya Ewropa bi kar tînin.
Heman daxwaz û hêvî pey hêrîşên Azerbeycan û Turkiyê li Nagorno-Karabax dubare bûn.
Ji cotmeha 2019 de dewleta Turk bê navber hêrîş dibe ser Rojava û Başûrê Kurdistan. Bi hevalbendên xwe, çeteyên Îslamî ve Efrîn zemt kirine. Ji wê demê û vir de li wê herêmê hovîtiyê dike. Xelk ketiye bin zor û zilmeke bêhempa. Di meha hezîranê de bombebarana Qendîl, Şingal û Xakurk bi ser ya Rojava de zêde bû. Rayedarên dewleta Turk xwedî giravî van hêrîşên xwe dijî terorîzmê dike. Hedefa van hêrîşan jî Kurd in. Hêzên ku bi bedelên giran, DAIŞ tertûbela kirin. Hedef têkoşîn û desthkeftiyên Kurdan ji bo jiyaneke bi rûmet xera bikin.
Ev çend heftî ye ku dewleta Turk bi Azrebeycan re bi awayekî heşkere hêrîşî herêma Nagorno Karabax dike. Armanc dagirkirin, talan û paqijkirina herêmê bi gelê, pirranî xiristiyan, li wira ye. Ji dema şerrê salên ‘90î heta niha ji 35 hezar kes zêdetir kes hatiye kuştin, bi deh hezaran mecbûr mane koçber bûne. Di van heftiyên dawî de hovîtiya dewleta Turk û Azerbeycan hê zêdetir e û dibe sedema wêrankirina pirralî.
Daxwazên berpirsiyarên YE, yên rêxistina ewlekarî û hevkariyê OSCE, ti encam ne girtine. Bersivên rayedarên Turk û yên Azerbeycanê bi awayekî tehdîdwarî didomin. Navbeynkaran jî ciddî nagrin.
Li ser hêrîş hovîtiya dewlata tirkî hember Rojava, li Başûr û Nagorno-Karabax bersivên serokwezîrê Flaman ne wek daxwazên me bin jî, erênî bûn. Wî bangî sefîrê Turkiyê kiriye û rexna û gomanên xwe heşkere gotiye. Di hemû civînên navdewletî de ev rexna xwe daye dubare kirin. Daxwaz kiriye ku heta dewleta Turk vê siyaseta xwe didome tedbîrên konkrêt, xurt û zû werin stendin û tedbîqkirin. Ji ber ku dewleta Turk di hemû aliyan de dijî normên YE kar dike. Di berteka xwe de da zanîn ku hikûmeta Flaman bi biryare, heta mimkin bibe aliyên siyasî li nava Beljîka û Ewropa di vê çarçewê de hemfikir bibîne û tevda li hember siyaseta Turkiyê ku di gelek waran de tehdîda nirx û normên demokrasiya YE ye tevbigerin.

Koordînasyona KJK’ê şehîd Bêrîtan bîr anî

Koordînasyona KJK’ê, Gulnaz Karataş (Bêrîtan) di salvegera 28’an ya şehadeta wê de bîr anî û berxwedana hêzên YJA Starê yên li Heftenînê li dijî êrişên dagîrkeriyê, silav kir.

Koordînasyona KJK’ê daxuyaniyek weşand û ji bo Gulnaz Karataş (Bêrîtan) got, “25’ê Cotmeha 1992’yan di şerê berxwedanê yê li dijî Kurdên noker, li Xakurkê heta fişeka xwe ya dawî şer kir û piştî ku fîşekên xwe neman ji bo ku bi saxî nekeve dest, li dijî banga teslîmiyetê ya çekdarên PDK’ê mîna Besêyan di dema komkujiya Dersimê de xwe ji serê zinar avêt û bi lehengî şehîd bû.”
Di daxuyaniya KJK’ê de hate gotin, “Havênê xet û dîroka me ya azadiya jinê, berxwedane. Sekna me ya berxwedêr û azadiyê ku bi pêşengiya Seroka Apo dest pê kir û di şexsê hevala Sakîne Cansiz de şênber bû, têkoşîna me ya azadiya jinê timî mezin kir. Ev têkoşîna me ya azadiyê bi bi hezaran şehîdên jin, bi berdêlên mezin, bi berxwedanên destanî bi pêş ve çû.
Meha Cotmehê ew meh e ku herî zêde şehîdên jin di wê mehê de hatine dayin. Di şexsê hevalên Gulnaz Karataş, Azîme Berwar, Rewşen, Gûrbetellî Ersoz, Meryem Çolak, Çiçek Gabar, Zinarîn Dêrik, Arîn Mîrkan, Gulnaz Ege, Çerkez Hêlîn, Canda Turk, Andrea Wolf, Lêgerîn Arjantîn, Hemrîn Xelef, Rojîn Gewda de şehîdên Kurdistanê hemûyan bi rêzdarî bi bîr tînin. Dema ku mirov bala xwe bidin ser şehîdên meha Cotmehê yên tevgera me ya azadiya jinê, wê bê dîtin ku tevgera me tevgereke çiqasî azadîparêz û fedayî ye, di şexsê şehîdên me de tevgera me çawa yekîtiya jinê ya neteweyî, Rojhilata Navîn û cîhanê afirandiye. Di afirandina vê karaktera gerdûnî û berxwedêriya tevgera me de girîng e pêşengî û keda rêberê me careke din bê destnîşankirin. Hevala me Bêrîtan (Gulnaz Karataş) hevalek, pêşengek me ye ku bi rengê herî bi heybet nîşanî me da ku pîvanên azadiyê yên xet û dîroka me ya azadiya jinê li dijî nokerî û xiyanetê xwedî sekneke bi çi rengî ye. Fermandara me ye. Di 25’ê Cotmeha 1992’an de tevlî şerê Xakurkê yê dijî Kurdên noker bû, heta fîşeka xwe ya dawî şer kir û piştî ku fîşekên xwe nema ji bo bi saxî nekeve dest, li dijî banga teslîmiyetê ya pêşmergeyên PDK’ê mîna Besêyên di dema komkujiya Dersimê de xwe ji zinar avêt û bi lehengî şehîd bû.
Bi israra xwe ya ji bo têgihiştina feraseta azadiya jinê ya Rêberê me, bi hêza xwe ya şîrovekirina vê ferasetê û bi biryardariya xwe ya ji bo pêkanînê, bû şehîdeke pêşeng a têkoşîna me. Di pêşvebirina artêşbûna jinê de bû çavkaniya hêz û sûdwergirtinê. Têkiliya navbera hezkirin, bedewî, azadî û şer bi rengekî xurt danî, di nava jiyanê de temsîl kir û felsefeya azadiya jinê, pîvanên jiyanê yên Serok Apo, berxwedana asta herî bilind a awarte ya jinên azad temsîl kir. Berxwedana ku hevala me Şehîd Bêrîtan li dijî nokerî, teslîmiyetê nîşan da, cewhera xeta me ya azadîparêziya jinê ye. Îro jî ji bo jinên Kurd rabûna li ber xeta xiyanet-nokeriyê, wezîfeyeke jiyanî ye. PDK îro jî herî dawî bi peymana qirêj a li ser Şengalê mohr kir, dixwaze bi heman rolê rabe.

Em hêzên xwe yên YJA Starê yên li Heftanînê ku bi ruhekî mezin ê fedayî, bi wêrekiyeke xurt, bi fedakariyeke bilind pêşengiyê dikin û detanên lehengiyê li berxwedana Heftanînê diafirînin, bi serbilindî em wan silav dikin û pîroz dikin. Di serî de hevalên Esmer û Nûcan em şehîdên Heftanînê hemûyan bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin. Em li ku dibin bila bibin, berxwedan ava me ya jiyanê ye.
Ji ber vê yekê em Serok Apo careke din silav dikin ku kevneşopî û tabûyên jinan dikin kole, zincîrên koletiyê parçe kiriye û rê li ber me vekiriye. Minetdariya xwe radigihînin.
Bi hezkirineke mezin, bi rêzdarî û dilsoziyê em Serok Apo silav dikin ku 21 sal in li Îmraliyê di nava sîstema êşkenceyê ya mezin de li ber xwe dide. Em careke din soz didin ku em ê hêjayî wî bibin.
Em hevala xwe Şehîd Berîtan a ku 25’ê Cotmehê şehîd bû, hevrêyên xwe yên jin ên di meha Cotmehê de şehîd bûn bi rêzdarî bi bîr tînin û bang li jinên Kurdistanê, Rojhilata Navîn û Cîhanê dikin ku di çarçoveya pêngava me ya “LI DIJÎ QIRKIRINA JINAN EM JIN Û CIVAKA AZAD DIPARÊZIN’ yekîtiya mezin a jinan biafirînin, têkoşîneke hevpar bimeşînin û berxwedanê mezin bikin.”

YJA STAR: Em bang li ciwan û jinan dikin ku li ser xeta Bêrîtanan serhildana azadiyê bi ser bixin

Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA STAR’ê bi pêmana salvegera şehîdbûna Bêrîtan (Gulnaz Karataş) daxuyaniyek da.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Hevrê Bêrîtan ku abîdeya berxwedanê ya mezin a meha Cotmehê, sembola bedewî, azadî û şer, fermandara bêhempa ya artêşbûna jinê ye, di salvegera 28’an a şehadeta wê de bi rêzdarî bi bîr tînin û di şexsê Gûrbetellî Ersoz, Saryla, Meryem, Elefterya, Hêlîn Çerkez, Ronahî Alman û bi dehan lehengên jin ên di meha Cotmehê de şehîd bûn li pêşiya bîranîna şehîdên xwe hemûyan bi rêzdarî bejan xwe ditewînin û Rêber Apo silav dikin ku ev kevneşopiya berxwedanê ya jinên Kurd afirand.
Meha Cotmehê, meheke berxwedan û têkoşînê ye ku bi berxwedana Bêrîtan weke destpêka artêşbûna jinê bi tîpên zêrîn li dîroka Kurdan hate nivîsandin.
Ji sala 1992’an û vir ve hêzên navneteweyî, teslîmkar û noker ji bo tunekirina tevgera me êriş dikin. Gerîlaya têkoşîna azadiyê ya PKK’ê Bêrîtan ku keçeke

leheng a Kurd bû, bi sekna xwe ji tevahiya cîhanê re ragihand ku gel û jinên Kurd ti carî teslîm nabin û ev berxwedan wê bi ser bikeve. Bêrîtan bi vê sekna xwe û helwesta xwe ya aadîparêz, weke nûnereke rastiya berxwedanê ya dîroka jinên Kurd, mîrateya ku ji Besêyan, ji Zarîfeyan wergirt, radestî nifşê ku wê paşerojê biafirîne kir. Li dijî hêzên PDK’ê yên netewperest û noker ên ku hewl didan wê teslîm bigirin, wê jiyana bi rûmet hilbijart, çeka xwe şikand û bêteredût xwe ji zinaran avêt, bi vî rengî li dijî teslîmiyetê bû banga berxwedanê. Rêber Apo ev bang weke nasnameya bi rûmet a jinên Kurd dît û bi armanca birêxistinkirina banga azadiyê ya jinên Kurd, ji bo bîranîna Bêrîtan piştî salekê ‘artêşbûna jinê’ ragihand.
Fermandariyê diyar kir, ku artêşbûna jinên Kurd ku bi salane li ser xeta Bêrîtan mezin dibe, îro li çar parçeyên Kurdistanê destanan dinivîsîne, bûye çavkaniya rizgarî û hêviyê ya gel û jinan.
Di dewama daxuyaniyê de hate gotin: “Jinên Kurd li ser rêya Bêrîtan artêşbûn û rêxistinbûna jinê bi pêş ve birin, xeta jiyana bi rûmet veguherand sîstemekê. Ev sîstem niha bûye tirsa herî mezin a hêzên kapîtalîst.”
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku êrişên bi konsepta hevpar a hêzên navneteweyî ya bi serkêşiya AKP û PDK’ê li Bakur, Rojava, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê tên kirin, xwerane-girtin, êriş û qirkirina li jiyana bi rûmet a Kurdan, li Kurdên azad û azadiya jinê ye.
Fermandariyê ragihand ku DAIŞ bi rêya AKP a ku dijminê jinan, êrişkar û rûyê herî qirêj ê sîstema bi serweriya mêr e, hîn bêhtir hov dibe û destnîşan kir, “Hewldanên dewleta Tirk ku civakê vediguherîne hêzeke mîlîtarîst, her roj bi polîtîka û pêkanînên bêperwa dewam dikin. Tundî û destdirêjiya ku îro li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê li dijî jinan tê kirin, êrişa li her cihî ya li dijî jinan, di şexsê azadiya jinê û jinê de êrişa li dijî jiyana azad a gelan e. Lê belê gelê Kurd ku xeta berxwedanê ji xwe re kiriye yekane rê û felsefeya jiyanê, îro li Rojava bi Zîn û Dilovanan, li Rojhilat bi Şîrîn Elemhûyî û li çiyê bi Esmer, Nûcan û Zelalan berxwedaneke efsanewî ya bêhempa nîşan didin û destnîşan dikin ku xeta Bêrîtan rêbazeke jiyanê ye, rêbazeke têkoşînê ye. Manîfestoya berxwedan û azadiyê ya ku keçeke Kurd a Dersimî li van çiyayan nivîsî ji bo gelê Kurd bû bijarka jiyanê. Keç û xortên Kurd û Ereb ên li Efrîn, Serêkaniyê, Heftanînê rabûn, bi berxwedana xwe ya bêhempa ev yek bi rengekî zelal nîşan dan.”

‘DEM DEMA AZADIYÊ YE’

Li her devera ku pêwistiya gelê me û jinan bi têkoşîna azadiyê heye, weke YJA STAR’ê em ê li wir bin û her tim amade bin. Eşqa azadiyê û xeta berxwedanê ya Bêrîtan wê artêşa me, milîtianiya me, dilsoziya me ya bi gelê xwe re û hezkirina Rêbertî teqez bi ser bixîne û armancên Rêbertiya Azad, Kurdistana Azad bi cih bîne.”
Di dawiya daxuyaniyê de afirînerê têkoşîna azadiya jinê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hate silavkirin û di şexsê Bêrîtan (Gulnaz Karataş) de şehîdên azadiyê bi rêzdarî hatin bibîranîn û soz hate dayin ku wê xeta wan bi serketinê tacîdar bikin.
Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA STAR’ê herî dawî ev bang kir: “Em bang li ciwanan û jinan hemûyan dikin ku di xeta Bêrîtan de têbikoşin, li çar aliyên Kurdistanê li ser xeta Bêrîtan li ber xwe bidin û serhildana azadiyê bi ser bixin.”

Pênciwînî: Peymana li ser Şingalê bi daxwaziya Tirkiya dagîrker çêbû

Siyasetmedarê Kurd Mihemed Emîn Pênciwînî diyar kir ku peymana li ser Şingalê ya di navbera hikumeta Iraqê û PDK'ê de, bi daxwaziya Tirkiyê pêk hat û got, eger Êzîdî vê carê jî bêdestek werin hiştin wê karesateke din were serê wan.

9'ê Cotmehê, hikumeta Herêma Başûrê Kurdistanê (PDK) û hikumeta Iraqê bê ku nêrîna nûnerên Êzîdî li ber çavan bigirin derbarê rêvebirina Şingalê de peymanek imze kirin.
Li ser vê mijarê siyasetmedarê Kurd ê yê ji başûrê Kurdistanê Mihemed Emîn Pênciwînî ji ANHA re nirxandin kir û got, peyman bê ku nêrîna Êzîdiyan were girtin, pêk hat.
Li gorî peymanê, Şingal ji hêzên leşkerî yên Şingal ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirîn, were valakirin.
Pênciwînî diar kir ku herêma Şingalê derveyî herêma Kurdistanê ye û got, peyman bi agahiya dewleta tirkî û Emerîka pêk hat û wiha domand: "Peyman ji bo razîkirina Tirkiyê

pêk hat. Ji ber ku di dema diyalogên hikumeta Tirkiyê û Iraqê de, Tirkiyê ji Iraqê xwest ku hemû alîgirên PKK'ê tune bikin. Niha jî daxwazên Tirkiyê pêk tînin. Pêncewînî ev yek bi "Hinceteke ne rast û ne qanûnî" bi nav kir.
Di demekê de ku pêşmergeyên PDK'ê û hêzên Iraqê ji Şengalê reviyan, Hêzên Parastina Gel (HPG) di xilaskirina êzidiyan ji pencên çeteyên DAIŞ'ê de roleke sereke lîst.

Pêncewînî diyar kir ku hikumeta navendî û hikumeta herêmê Êzidî û Şengal û tevahî herêm neparastin û bi bîr xist ku çeteyên DAIŞ'ê herêm dagir kir, komkujî li dijî êzidiyan pêk anîn, jin û zarok revandin, Pêncewînî metirsiyên xwe anîn ziman ku li dijî herêmê komkujiyeke din mîna ya DAIŞ'ê pêk werin ev pirs kir: "Fam nakim, çawa hikumeta herêmê û hikumeta navendî wê vê herêmê nihat biparêzin."
Siyasetmedar Mihemed Emîn Pêncewînî di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku piraniya Êzidî vê peymanê red dikin ji ber ku dûrî îrade û rêveberiya wan e. Her wiha bang li civaka Iraqê kir êzidiyan biparêzin da ku fermaneke din li dijî wan dûbare nebe.

Girîngiya zıman û Hevserokatî

Ahmet AKTAŞ

Ji bo bi giştî Kurd û Kurdistanê, bi taybetî ji bo Rojava û Bakur-Rojhilatî Suriyeyê, du serkeftiyên herî bi rûmet û bingehîn; perwerda bi ZIMANÊ DAYIKÊ û sîstema HEVSEROKATIYÊ ye. Heta nuha me gelek dît ku neyarên gelê me û gelên herêmê bi giştî, dujminatiya van herdû mijarên bingehîn dike û êrîş li ser êrîşê dike. Lê belê Tevgêra Azadiyê bi giştî û Şoreşa Rojava bi teybetî, li himber van êrîşên dujiminên mirovahiyê serê xwe ne tewandin û weke şêr û lehengan xwe ragirtin û îradeya xwe ya berxwedêr a rêveberiya xweseriya demokratî û jiyana azad her geştir û xurtir kirin.
Erê ev êîşên mijara gotinê bûn, ji ber ên dewletên dagirker û mêtinger bûn, lewma bêmanetî bûn. Lê sed car mixabin, yên weke ENKS'ê ku bi navê kurdî bang li li xwe dikin û radibin li dijî van her du mijar û stûnên bingehîn ên gelê me û hemû gelan û pêkhateyan derdikevin, ev cihê şerm, eyb, fêhd û gazindê ne. Weke însan tiliyên xwe bixe çavên xwe! Ya ev kesên vê qebhetê dikin, ji aliyê dîrokî ve, civakî ve, felsefî ve, bîrdozî ve an jî derûnî ve xwedî kêmasiyên mezin in. Ya berovajî, yên li himberî xwe kêm aqil dibînin. Ya jî, ji bilî vanan ji dujmin ditirsin û ketine xizmeta wan-ji ber ku bi salan e li gel neyarê sereke dewleta Receb Erdogan in! Van hersê bijareyên hatin gotin, yek ji ya din xerabtir e.
Li gel van xislet û hilwesî û nesîhetên xerab hemûyan jî, dîsan mirov dikare bi bangek erênî nêzî wan bibe, da ku heta nuha gavên hatine avêtin, ji bo Yekrêziya Kurdî, li ser were meşandin. Belê divê ew aqil û têkiliyên li gel neyaran li Enqere û Stenbolê werin hiştin!
Ew sedema ku bila perwerde bi zimanê dewletê, bi erêbî be jî di-din pêş, xwedêgiravî, piştî xwendin temam bibe kes vê xwendinê nasnake/îtirafê pê nake. Ma gelo heta nuha ti dewletê em kurd nas kirine ku perwerdeya me nas bikin? Gelî xwuşk û bira, dev ji vê sedema pûç û beradayî berdin, werin ser rêya rast a ku gelê te daye ser dimeşe, tu jî bimeşe tu dijmin nabe!
Ji xwe ew mijara dina a Hevserokatiyê, qet nabe nîqaş li ser wê jî were kirin. Ev mijarek bîrdozî ye, ev destçûyînek dîrokî bû, lê ev nêzî deh sala ye hatîye bi destxistin û vê serkeftina pîroz, cihê xwe di nava civakê û cîhanê de qayim kiriye, kes êdî nikare vê destkeftiyê ji gelê me û bi taybetî ji jinên pêşeng û leheng bistîne. Ev her du destkeftiyên Şoreşa Rojava li gelê me û mirovahiyê hezar carî pîroz be! Eger hûn jî-ENKS, hez dikin xwe ji wê gemara R.Erdogan rizgar bikin, kerem kin werin bibin hevparê vî kar û vê xaka pîroz!

Sancar: Em tifaqa kurdistanî mayînde dikin

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Mîthat Sancar bi partiyên Kurdî re civiya û got, "Me biryar da ku em vê platforma xwe ya bi partiyên di nava Tifaqa Hilbijartinê ya Kurdistaniyê de cih digirin re, mayînde bikin."
Hevserokê Giştî yê HDP'ê Mîthat Sancar û parlamenterên HDP'ê Meral Daniş Beştaş, Îmam Taşçier, Alîcan Onlu, Nûsrettîn Maçîn û Nejdet Îpekyuz, li Otela New Garden a li navçeya Yenîşehîrê ya Amedê bi nûnerên partiyên Kurdî re civiyan. Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Berdan Ozturk, Hevserokên Giştî yên Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) Salîha Aydenîz û Keskîn Bayindir û nûnerên Komeleya Kurd a Demokratên Şoreşger (DDKD), Partiya Însan û Azadiyê (PÎA), Partiya Komunîst a Kurdistanê (KKP), Platforma Kurdên Demokrat-Bakur (PDK-Bakur), Partiya Demokrata Kurdistanê-Tirkiye (PDK-T) û Partiya Azadî beşdarî civînê bûn. Nûnerên partiyan di civînê de li ser yekîtiya Kurd nîqaş kirin.
Piştî nîqaşan Sancar daxuyanî da. Daxuyaniya wî wiha ye:

"Îro em bi partiyên Tifaqa Kurdistanî re hatin cem hev. Civîneke pir erênî û baş bû ji bo me. Em di gelek mijaran de bi zelalî li ser wê axivîn. Me di vê civînê de bi kêfxweşî biryarên şênber girtin. Weke ku rêzdar keke Mehmet Emîn jî eşkere kir, me li ser vê platforma xwe ya li ser tifaqa hilbijartinê pêk hatî biryara mayîndekirina wê girt. Em gihîştin heman nêrînan û wê platforma me bi hev re tevbigere.

Fransa bang li balyozê xwe yê li Enqere kir

Serokartiya Fransa gotinên serokkomarê Tirkiyê Recep Teyyîp Erdogan yên têkildarî serokkomarê Fransa Emmanuel Macron, bi "nayên qebûlkirin" nirxandin. Serokatiyê ragihand ku bang li balyozê xwe yê li Enqere kiriye da pê re nîqaş bike.
Serokatiya Fransa, daxyaniyên Erdogan ku gotibû serokê Fransa ji hişê xwe nexweş e, şermezar kirin.
Serokartiya Fransa ji AFP'ê re da xuyakirin ku gotinên serokkomarê Tirkiyê Erdogan nayên qebûlkirin. Zimanê hişk û piçûkxistin xeta danûstandinê

temsîl nakin."
Serokatiya Fransa wiha got: "Em ji Erdogan dixwazin ku siyaseta xwe biguherîne. Lewre ji tevayiya aliyan ve xeter e. Em derbasî nîqaşên kûr nabin û gotinên nebaş qebûl nakin."
Serokartiya Fransa ragihand ku bang li baylozê xwe yê li Enqere kiriye da pê re nîqaş bike.

Meclisa Ciwanên Partiya Sûriya Paşrojê ya herêma Firatê hat avakirin

Konferans li navçeya Sirîn ya kantona Kobanê li dar ket. 250 delegeyên partiyê yên ji navçe û bajarên herêma Firatê beşdarî konferansê bûn.
Konferans bi durişma "Bi têkoşîna yekîtiya gelan....ji bo Sûriyeke azad...emê teqez bi serkevin" hat lidarxistin.
Piştî rêzgirtinê bi navê bûroya giştî ya partiyê Îbrahîm Cuma, serokê partiyê yê herêma Firatê Îsmaîl Xalid, bi navê Meclisa Malbatên Şehîdan Ahîn Elûç, bi navê Rêveberiya Xwser Hezai Mihemed û bi navê ciwanên Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Adil Feraşîn axivîn.
Piştre rêzîknameya Meclisa Ciwanên Partiya Pêşerojê ya Sûriyê hate xwendin û bendên wê hatin nîqaşkirin. Rêzikname ji aliyê beşdaran ve hate erêkirin.
Piştre hilbijartin pêk hat. 15 endamên Meclisa Ciwanan ya herêma Firatê hatin hilbijartin. Ev endam wê beşdarî hilbijartinên kongreya giştî ya partiyê ya li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibin.

PDK vê carê hêza xwe dişîne Garê

PDK'ê hêzeke xwe ya taybet şand herêma Garê û dest bi çêkirina çeper û baregehên nû kir.

Li gorî nûçeya Rojnewsê ku agahiyên xwe spartine çavkaniyên herêmî, PDKê hêzeke bi navê Gulan ku girêdayî Mesrûr Barzanî şand bajarokê Dînartê û deşta Nehlê ya girêdayî navçeya Akrê ya Dihokê. Herwiha hat gotin PDK'ê çekdarên xwe yên bi navê 'pêşmergeyên Roj' jî li gel hêza taybet ya Gulan birine herêmê.
Li gorî heman çavkaniyan, hêza Gulan yekser bi Mesrûr Barzanî ve girêdayî ye û ji ber ku pêşmergeyan nexwestiye derbasî herêmên di bin kontrola gerîla de bibin, Barzanî hêzeke leşkerî ya taybet şandiye herêmê.
Li gorî çavkaniyên herêmî gelek wesaitên leşkerî yên bêplake,

çekên giran, wesaitên taybet yên sîvîl derbasî herêmê bûne û li gundê Melkê, Dosteka, Gîsê, girê Dînartê, girê Mezrînganê, girê Navxoş, girê Difrî, Mamişmiş, gundên Asûriyan yên dikeve herêma eşîreta Zêbariyan dest bi çêkirina çeper û kozikan kirine.
Bajarokê Dînartê û deşta Nehlê girêdayî navçeya Akrê ya bajarê Dihokê ye. Lê herêm dikeve nêzî çiyayê Garê ku bi herêma gerîla jî tê nasîn.

Di şerê li Hemayê de 61 leşkerên hikumeta Şamê û çeteyên DAIŞ'ê hatin kuştin

SOHR'ê bi daxuyaniyekê eşkere kir ku di şerê rkojên dawî yên di navbera hêzên hikumeta Şamê û çeteyên DAIŞ'ê yên li gundewarê rojhilatê Hemayê de ji her du aliyan 61 kes hatine kuştin.
Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê (SOHR), ragihand ku li eniya Rehcan, Şakoşiyê, Aseriya û û eniyên din yên gundewarê rojhilatê Hemayê di navbera çeteyên DAIŞ û hêzên hikumeta Şamê de şerên giran diqewimin.
SOHR got, çeteyên DAIŞ'ê tevî êrişên hawayî yên Rûsya û hikumeta Şamê, êrişên xwe didomînin û dest danîne ser gelek baregehên leşkerî û alav û cebilxaneyên hêzên hikumetê yên li gundewarê Aseriya.
Li gorî heman çavkaniyê, di şerê rojên dawiyê de jimara kuştiyên hêzên hikumeta Şamê gihat 39'an û ya çeteyên DAIŞ'ê jî 22.

Partiya Sûriya Paşrojê li Helebê meclisa ciwanan ava kir

Bi armanca birêxistinkirina ciwanan û çalakkirina rola wan di civakê de, Pariya Sûriya Paşrojê şaxê Helebê, meclisa ciwanan ava kir.
Civîna avakirina meclisê bi durişma "Bi têkoşîna gelan ji bo Sûriya azad" li dar ket. Civîn li hola civînan a rojavayê taxa Şêxmeqsûd li dar ket û tê de nûnerên partiyên siyasî, saziyên siyasî û ciwan amade bûn. Serokê Meclisa Pariya Sûriya Paşrojê ya Helebê Mihemed Hecî, hevseroka Meclisa Malbatên Şehîdan a Helebê Roşîn Mûsa û hevserokê Meclisa Giştî ya taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiye Mihemed Şêxo axivîn.
Axaftvanan bal kişand ser rola ciwanan di pêşxistina civakê de û bersivdayîna planên dagîrkirin, asîmîlasyon û qirkirinê.
Piştre rêziknameya meclisa ciwanan hat erêkirin û 15 endam ji bo meclisa ciwanan hatin hilbijartin.

Emerîka û Estonya ceza li Hizbullaha Lubnanê birîn

Wezareta Gencîneyê ya Emerîka ragihand ku ceza li sazî û rayedarên ku têkiliyên wan bi Îranê re hene, birîne.
Hikumeta Estonya jî ji ber "çalakiyên terorê" yên Hizbullahê, ceza lê birî.
Nivîsgeha Çavdêriya Çandên Biyanî ya Wezareta Gencîneyê ya Emerîka ceza li 2 endamên Meclisa Navendî ya Hizbullahê yên bi navên Nebîl Qaûq û Hesen Bexdadî birî.
Wezaretê diyar kir ku fermandarên Hizbullahê ji avakirina rêxistinên terorîst û pêkanîna ajandeyên rêxistina terorîst, herwiha ji xetera li ser berjewendiyên Emerîka û



hevalbendên wê li seranserê cîhanê, berpirsyar e.
Hikumeta Estonyayê jî ji ber "çalakiyên terorî" ceza li Hizbullahê birî û diyar kir ku gefan li ewleyiya navneteweyî û Estonya dixwe.
Piştî Almanya û Lîtvanya, Estonya dewleta 5an e ku biryara qedexekirina Hizbullahê di aliyê siyasî û leşkerî de dide.

Sûriya berê mûmkin e?

Zekî BEDRAN

Li Sûriyê aştî dûr xuya dike. Di serî de Tirkiye zemînekî mezin yê xetera şer li ciyê xwe sekiniye. Li ber çavê Rûsya Idlib kir herêmeke leşkeri. El-Nusra û bin dehan rêxistin li herêmê di binê paraştina Tirkiyê de xwe bi rêxistin dikin û amadekariya şer dikin. Dewleta tirkî bi qasî ku tere şerekî mezin bike hêz û pêdiviyên şer bi cî kirine. Di binê navê SMO de bi dehhezaran hêzên çekdar amade kirin. Li hemberî artêşa Sûriyê artêşekê ava dike. Bi van hêzan Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr kirin û di deştê xwe de digire.
Faşîst Erdoğan, di her firsetê de dibêje, emê êrişî rojhilatê Firatê bikin. Ji bo dakîrkirinê li firsetan digere. Eger bi Emerîka û Rûsya re li hev bike wê êriş bike. Çawa ku li Idlibê tê ditin Rûsya bi Tirkiyê re şer nake. Emerîka dibêje, li hemberî rêveberiya Esed û Rûsya emê piştgiriya Tirkiyê bikin. Israîl û Emerîka baregehên Îranê yên li Sûriyê dixe. Bi kurtayî qeyrana li Rojhilata Navî û Sûriyê û şer dewam dike.
Ka wê hilbijartina Emerîka bandoreke çawa li Rojhilata Navî û Sûriyê bike baş nayê zanîn. Ya tê zanîn ew e ku ji bo serkeftina Trump Erdogan dua dike. Lewre pê re bi pazareke qirêj û bidizî ji bo dagîrkirina deverên weke Serê Kaniyê li hev kir. Erdogan dihizire eger Trump bi ser nekeve wê vê awantajê ji deşt bide. Gelo wê Rûsya li hemberî êriş û dagîrkirinên Tirkiyê helwestê nîşan bide? Zêde baweriyê nade. Dagîrkirina Efrîn û Serê Kaniyê li ber çavan e. Sûriye li aliyekî Tirkiyê êrişî Ermenistan û Qerebaxa li tenişta wê kir. Hefte derbas bûn, bi hezaran mirov mirin Rûsya temaşe dike. Eger Tirkiyê bizaniya ku wê Rûsya qebûl neke şer organize nedikir. Wisa xuya dike ku ji bo Rûsya ne dost û hevalbendên wê, berjewendiyên wê girîng in. Rewşa aboriya Sûriyê pir xerab e. Ya rast aboriya wê roxiyaye. Ambargoya Emerîka û koalisyonê dewam dike. Welat bûye sê parçe. Beşeke girîng di destê Tirkiyê de ye. Li wan herêman pereyên Tirkiyê bi kar tên. Malê Tirkiyê herêm dagîr kiriye. Digel van tevan ji rêveberiya Şamê ger û hewldaneke jidil xuya nakin. Herî kêm dikare bi herêmên xweser yên bakur û rojhilatê welat re li hev bike. Lewre rêveberiyên xweser her tim dibêjin em amade ne bi Sûriyê re hevdîtinan bikin û di nava yekbûna Sûriyê de pirsgirêkan çareser bikin.
Eger rêveberiya Şamê bi rêveberiyên xweser re li hev bike, ji bo yekbûna erdê Sûriyê wê bibe gaveke mezin. Li hemberî hêzeke wisa hevgirtî ti kes nikare dagîrkeriya Tirkiyê biparêze. Digel çeteyên li cem wê gelek derdor dev ji Tirkiyê berdin. Wê Şam hem awantajê bixe destê xwe hem rewşa xwe xurt bike. Wê rewşeke wisa bandorê li Rûsya jî bike û her ku biçe wê Tirkiye tengav bibe. Digel ku rewş wiha eşkere ye berê Şamê li devereke din e. Ji demokratîkbûn û xwerexnekirinê pir dûr e. Tişta ku dizane miliyetgeriya erebî geş bike û her kesî bike koleyê xwe. Dixebite ku herêmên xweser tevlîhev bike û şerê navxweyî belav bike. Çawa ku Sûriyê têra xwe şer nekiribe, bi sedhezaran nemirin bin. Halbiku aborî pir xerab e, gel perişan e û bi sedhezaran di konan de bûne koçber.
Eger rêveberiya Şamê rast bûya ev bûyer nediqewimîn. Ji ber wê israra di pergala kevin de tê wateya ku çareseriyê naxwaze. Bi piştgiriya Rûsya dikare heta kû biçe? Ya rast ew e ku sûdê ji hebûna Rûsya bigire, bi gel re bibe yek û aştiyê bike. Bêguman ne ku îradeya gel bişkîne û wan bike kole.
Yên li Şamê rûdinin divê derbarê aştiyeke rast û demokrasiye de ne durû bin. Bi hişmendiya Beesê pirsgirêk çareser nabin. Bi wê hişmendiyê wê her tim welat ji qeyran, nediyarî û şer re vekirî be. Wisa xuya dike ku Şam li bendê ye ku Emerîka ji welat derkeve û bi qirika gelên herêmê bigire. Ka wê Emerîka derkeve, çi demê derkeve baş nayê zanîn. Emerîka jî vala nasekine. Ew jî li hemberî Şamê ambargoyê girantir dike. Li Idlibê piştgiriya Tirkiyê dike. Hêzên dijberên Şamê destek dike.
Tişta ku tê ditin nediyarî, berjewendî û planên piralî hene. Aştî û demokrasî çiqas zû pêk werin wê gel ewqas rehet bibe. Tişta di berjewendiya gelan de aştî, demokrasi û yekîtî ye. Ji bo wê yên dibêjin em welatparêz in, yekîtiya Sûriyê diparêzin û li heberî dagîrkeriyê divê ji bo Sûriyeke demokratîk bikevin tevgerê. Divê rewşenbîrên Sûriyê, partiyên wê û hêzên civakî di eniyeke demkokratîk de werin cem hev. Divê gelê Sûriyê zana, perwerde û bi rêxistin bikin. Ancax bi vî awayî bikarin hêzên dagîrker bêbandor bikin.